

Dumahîk: Osîtiyaya...

Ango nîr û mercên berê yê avakirina dewletan hatine guhartin , li bejna guhertinên şaristanî yê cîhanî yê vê dema nayên. Li ber ronîya zagonên mafên mirov û gelan, tenê sînor, al, sirûda netewî û artêş dewletên biserkeftî çênakin û hemî tişt jî gereke ne tiştine pîroz bin, nemaze eger ew dewlet zordar bin û mafên gelên navxwe bipê dîkin.

Roja îro gel, civak, ol.. çiqas biçûk bin jî, gereke mafê wan were paastin û bi şêweyekî dilxazane û li ber ronîya dadmendî û wekhevîyeke restî bijîn, cih û para hemîyan di şaristaniya pêşverû de hebe û çarenûsa her miletekî di destê wî de be.

Ji bo pêkanîna vê rastiyê, çare ew e ku hemî pirsên azadiya gelan, çi di hundur dewletekê de û çi di nav dewletan de bi riya zanîn, hiş, gotûbêj û bi şêweyên aştîyane werin çareserkirin. Ticarî hêz, artêş û kuştin pirsên dadmend, nemaze pirsên azadiya gelan ku dixwezin xwe li ber ronîya şaristaniya nûjen bibînin û bijîn, bi darê zorê çareser nabin û namirin jî. Li bervajî wê, ew siyasatên tund û çewt ku li gelek deveran tê ajotin, di riya pêşdeçûna şaristaniya mirov de dibin kelem û astengên bê wate, û ziyandar.

Di rojhilata navîn bitenê de, gelek mînakên tunekirina azdîyê yê ziyandar ên giran hene, û şêweya çewt ya çareserkirina wan ta radeke bilind di paşdemayîna gelên navçê de pardedar in. Wek pîrsa gelê Kurd ku çar dewlet pê mijûl dibin. Pîrsa Flestîne... û gelîna din jî.

Ew kêşe salê bi hezaran mirov dîkin qurban, bi milyaran pere dirjên û bi dehsalan gel û millet li şûn dimînin.

Di nav Komara Rûsyaya Federal bi xwe

de jî hîn gelek pirsên dadmend yê gelên Qefqasê bêçareserkirin mane û sazûmanê kamara Rûsyaya Federal dixaze doza wan ya serbixwabûn û azadiyê bi darê zorê bitemrîne.

Baş xuya dibe ku piştgiriya tund ya Rûsiyayê ji mafê gelên Ebxaziya û Osîtiya Başûr re, gelek hesabên siyasî yê yaybet ên dûrî madariya wan herdu pirsan jî dide ber xwe. Çinkî gelek hesabên Rûsan bi Rojava re hene û Rûsî pê tengijîne, wek hesabên Belkanê, Mûşekên mûşekbir, xwexuşandina Nato bi rojhîla'de, payebilindîya Rûsiyayê ya ku kêma bûye...û hwd, gelek kînen xwe yê din yê nepen jî bi Emerîka û Yekîtiya Ewropa re sax dike. Yanê piraniya dewletên mezin û di siyaseta cîhanê de xudî rol in, mafê gelan yê mafdar ji perjewndiyên xwe yê taybet re dîkin mortal. Loma jî gereke mirov li dijî wê ton siyasatê rawesta û dengê xwe li hemberê bilind bike. Çinkî tirs ew e, ku sibe Rûsya mafê rewşa yê ew herdu gelên biçûk di serbixwebûnê de, daxê bazara navdewletê û bi wan bihayeke erzan bifroşe. Ji bilî ku ew siyaseta çewt û kiryarên Rûsya û Gurcistanê jî buvehîyeke rastî û îjîdil di navbera dewletên rojava û Emerîka de li hêlekî û Rûsya û alîgirên wê de peyda dike.

Em bawer in, ku ew herdu gelên Ebxazî û Osîtî doza mafekî rewşa û dadmend dîkin, û mafê çarenûna gelan li her demê û li her cihî mefekî rewşa ye. Ew maf di hemî destûr û zagonên zemînî û ezmanî de hatiye nîşandan û pejirandin, û gereke ji hêla hemî dewletan ve bi awirên şaristanî û dadmend lê were nêrin û bi şêweyên aştîyane û mafdar û dûrî berjewendiyên dewletên mezin û tundî û nijadperestiyê werin çareserkirin.